

Pispor li gorî cerebeyan: Cîwarbûna dayikeke bi tenê

Hevpeyvîna me ya bi Rana re bixwîne ku bi awayekî jidil behsa zehmetiyên derketina ji Sûriyeyê û wekî dayika du keçan ya bi tenê meşandina vê rêwîtiyê dike.

Rêwîtiya ji welatê xwe bo welatekî din, û bi riya cîwarbûnê bo welatekî dîtir ji bo hemû malbatan tiştekî zehmet e – û ji bo yeka bi tenê hê zehmettir e. Di rewşeke wisa de heke mirov dikaribe ji hevîna/ê xwe pirsên gelekî zehmet yên wekî ‘ma em mecbûr in herin?’, ‘wê çi bi serê me bê?’, ‘em ê ji zarokan re çi bibêjin?’ bipirse, ev ê baweriyekê bide mirov. – ji bo dê yan bavekî bi tenê tiştekî wisa tune ye. Ev rêwîtiya Rana ye ku wê sala 2019an bi pêşwaziya ji aliyê koma Sponsorîya Civaka Dêrên Başûrê Liverpoolê ve li paş xwe hişt.

Rana bi hurmet li ba me rûnişt û ji me re behsa pêşwaziya û piştgiriya koma Sponsorîya Civakê ya du salên dawiyê, behsa mezinkirina du zarokan bi tena serê xwe, hêviyên ji bo malbata xwe û hestên cîwarbûna li UKê kir.

Mercên te yên veqetîna ji welatê te Sûriyeyê çi bûn?

Em ji ber şer derketin. Gava dibistana keça min hat bombekirin û du hevalên wê hatin kuştin, ez gelekî tirsîyam, loma min bi keçên xwe girt û ji Sûriyeyê derketim. Me karî ji bo Iraqê vîzeyekê bistînin û em bi balafirê çûn wê derê.

Jiyana li Iraqê çawa bû, bi taybetî ji bo dayikeke bi tenê?

Jiyana wê derê ji hemû aliyan ve gelekî zehmet bû. Beriya her tiştî, wekî dayikeke bi tenê mezinkirina du keçan berpirsariyê gelekî mezin e. Ya didoyan, gava em çûn herêma kurdî ya Iraqê, zimanê wê derê cuda bû. Em bi zimên nizanibûn û me nedizanî bi mirovan re çawa bidin û bistînin. Xala sisêyan jî aborî bû, min ê çawa ji bo malbata xwe pere qezenc bikira, ku tekane berpirsa vê ez bûm ku min biryar dabû malbata xwe bibim Iraqê.

Li Iraqê ji bo qezenckirina pereyan min xwarin çêdikir û difiroto malbatên din, û min li mizgeftê dersên Quranê jî dida. Gava min xwarin çêdikir, min xwarinên têkel çêdikirin, xwarinên Sûriyeyê û yên Iraqê. Mirovan pesnê xwarinên min dida ku wan

xwarinên wekî yên min nexwaribûn. Wan jê hez kir û wan xwarinên min kirîn, û vê alîkariya min kir ku Iraqê li ser piyan bimînim.

Keça min a mezin ji ber bêderfetiyan me mecbûr ma dev ji dibistanê berde. Ji ber ku pereyê min qezenc dikir tenê têra xwarinê û kirê dikir, min nedikarî tiştêkî bikim. Ji vê pê ve min nedikarî tiştêkî bikim. Veqetîna ji welatê xwe ez gelekî xemgîn kirim, lê ku min nekarî keça xwe bidim xwendin ez gelekî xemgîntir bûm. Gava keça min didît zarokên din diçin dibistanê, ew digiriya û ji min dixwest ku jê re çente û alavên dibistanê bînim ku ew jî here dibistanê. Gava em ji Sûriyeyê derketin, min nedizanî ka em diçin ku derê yan ka wê çî bi serê me bê. Lê wê çaxê hizra min ew bû ku çêtir bû ez xanî û pereyên xwe winda bikim ne ku keçên xwe.

Derketina ji Sûriyeyê bandoreke çawa li ser keçên te kir?

Derketina ji Sûriyeyê bandoreke gelekî negatîv li ser keçên min kir, lewre min nedikarî jiyaneke çêtir bidim wan. Em di asta herî kêr de dijîyan. Li mala me ya li Iraqê tenê tiştên bingehîn hebûn û min nedikarî zêdetir bidim wan. Her wisa, me wisa hîs dikir ku em di nav civaka kurdî de nayên xwestin diîtin. Me dixwest em bi cîranên xwe re bibin dost lê wan bersiv nedida me. Wan nedihîşt zarokên wan bi yên min re bilîzin.

Gav ez li ser van deman difikirim, ev gelekî zehmet bû. Ez ji ber vê yekê hatim vê derê. Û koma Sponsorîya Civakê ji gelek alîyan ve alîkariya min kir, ji bo tenduristiyê, ji bo xwenedinê û ji bo tiştên wekî kirîna tiştên ji bo xwarinê. Û ev ji bo min ecêb bû, lewre li Iraqê her tişt berevajî ve bû, mirovan nedixwest nêzî me jî bibin, lê li virê kom ji bo her tiştî alîkariya me dike.

Gava tu ji UNHCRê hîn bûyî hûn ê li UKê bi cî bibin, te çî hîs kir?

Gava zilamê li ser telefonê gote min ku em ji bo cîwarbûna li UKê hatine hilbijartin, min rondik barandin. Ez ketim erdê û min gotê, 'tika dikim, tiştê te gotî dubare bike, tika dikim tiştê te gotî dubare bike'.

Min her car hîs dikir ku wê bi awayekî ji me re bibin alîkar. Min wisa hîs dikir ku Xwedê wê me bi tenê nehêle, ew ê ji me re alîkariyê bişîne. Û ji bo xatirê keçên xwe min nedikarî ez dev jê berdim, min hîs dikir ku divê ez ji bo xatirê wan têbikoşim.

Hatina UKê ez netirsandim. Ez xwende me, min li Sûriyeyê IT û karsazî xwendiyê. Û wekî min bihîstibû UK yek ji welatên herî baş yê cîhanê bû, welatekî ku xelk

dixwazin zarokên xwe ji bo xwendinê bişîninê. Loma gava min bihîst em ê herin UKê, min fêm kir ku em diçin welatekî ji yê herî baş. Û ji min re surprîz bû ku welatekî wekî UKê ez û keçên min qebûl kirin.

Du salên dawiyê yê li UKê ji bo te û malbata te çawa bûn?

Ev du salên herî xweş yê jiyana min bûn. Ev wekî destpêkekê bû, wekî jiyana min dîsa dest pê kiriye. Wekî ku her tiştî rê dida hindê ku em werin UKê û em bibin parçeyeke UKê û civaka wê. Xelkê vê derê wekî mirov nêzîkî min bûn. Wekî min gotî, li Iraqê xelkê silav jî nedida me. Lê li vê derê her kesî wekî mirov nêzîkatî li min kir.

Zehmetiya herî mezin ya cîwarbûna li virê astengiya zimên bû. Tekane tiştê ji bo min zehmet ev bû. Hemû tiştên din diketin rîya xwe, ev jî bi xêra koma Sponsorîya Civakê bû. Endamên komê dixwestin ji bo her tiştî ji min re bibin alîkar. Hinekan dixwest ji min re randevuyên tenduristiyê çêkin, hinekan dixwest di mijara wergirtina alîkariyan de û wekî din. Ev hestekî wisa bû ku em malbateke mezin in, hemû endamên komê nîşanî min dida ka tiştê gav bi gav çawa pêk tên.

Gava ez li ser rîya UKê bûm, ez difikirîm ku ji keçikan re cilan bikirim. Lê gava ez hatim mala vê derê, dolab bi her tiştî tije bûn. Sol, cil, her tişt amade bû û li benda me bû. Û gava dibistanê dest pê kir, komê em birin kirîna cilên dibistanê ji bo keçikan. Ji bilî zimên, tiştêkî din ne zehmet bû û ev bi xêra piştgiriya komê bû.

Komê ne tenê ji bo tiştên bingehîn alîkariya me dikir, lê wan em dibirin gerên birc û keleşan, restoranan û Walesê. Qet hesteke wisa çênebû ku wan ev wekî kar yan jî ji bo pereyan dikir, em her car wekî hevalan û malbatekê bûn. Û tiştê ez pê kêfxweş dibûm ev bû ku ev jiyana min a niha bû.

Û cîranên me jî ji me re gelekî qenc bûn û diyariyan dan me. Heke cîran min sê yan çar rojan nebînin, ew ê bipirsin ka rewşa min baş e yan na!

Ji bo dahatûyê çî daxwazên te hene?

Tiştê ez dixwazim ev e ku ez dikaribim hemşîretiyê bixwînim û bibim hemşîre. Ez dixwazim li Liverpoolê klînîkeke biçûk vekim û li wirê bi her du keçên xwe re bixebitim. Mirovên li Liverpoolê gelekî qenc in û ez jî dixwazim ji wan re wisa qenc bim.

Çi ye wateya sponsoriya civakê ji bo te?

Ji bo min, wateya wê jiyana nû û dahatûya baş e. Komê kir ku em xwe dîsa wekî mirov hîs bikin û em hest bikin ku em dikarin tiştên em dixwazin bi dest bixin. Ew wekî malbata me ne. Ew tu caran wekî biyaniyan nêzîkî me nebûn, lê wekî malbata me bûn.

Ji bo hemû malbatên dixwazin werin UKê, ez dixwazim bibêjim ku mirovên wê derê gelekî qenc û baş in. Koma ku pêşwaziya me kir gelekî piştgir û teşwîqkar bû. Komê ji tiştên min hêvî dikir zêdetir kir. Û şîreta min a li hemû malbatên têne vê derê ev e ku li ser zimên hûr bibin, ji ber ku gava mirov li virê zimên bizane dikare her tiştî bi dest bixe.

Kom ji bo me malbateke mezin e, wekî diyariyeke ji Xwedê ye. Ez hêvî dikim hemû kesên tên UKê malbatên wisa bibînin.

Spas Rana ku te çîroka xwe bi me re parve kir.